

## Pela agahîyê Divêt bo xanî guherranda pîlankirî bal bidin çi?

Gorî yasaya komelgehî/civakî pirtuka duwem (SGB II( benda 22, feqera 4 pêwiste mafdarê alîkarîwergir berî destnîşankirina grêbesta bo xanîyekî nu desteberîya / rêzmandîya fermangeha komelgeha deverî werbigre bo ezmunên mercên xanîyê nu u berçavgirtina mesrefên nu.

Berpîrsê komelgehîya deverî bo xanî-guherrandina di nav tixubên qeza Schmalkalden-Meiningen jobcentera deverî ya qeymeqamîya Schmalkalden-Meiningen, Obertshausen Platz 1, li 98617 Meiningen an jî şaxa fermangehê li Sandgasse 2, 98574 Schmalkalden peywendîdar in.

Heke hun jî derve bardikin bo qeza me, divêt rîzemendîya jobcentera komelgeha me were girtin.

Mesrefên peydekirina xanî u mesrefên barkirinê dikanin bi rêzmandîya fermangeha berê ya cihê nişteçîbuna pêş werin qebulkirin. Temînata kirê an para ewqafî bo kirêkirina xanî dikane jî bal fermangeha berpîrs yê cihê nu were qebulkirin.

Bo kartêdekirina daxwaznameya we **axaftina we ya şexsî li qeymeqamîyê îcbarî pêwiste.**

Ev belgeyên jêr divêt dema axaftina we de werin pêşkêşkirin:

- daxwaznameya xanîguherrandinê bi **bingehkirina durudirêj bo pêwistîya xanî-guherrandinê,**
- divêt bi qa`îde kêmtirîn du pêşniyarên xanîyên kirêkirinê bo xanîyê nu bi agahîyên hurgilî li ser mezinahî, kirya sar, mesrefên dihêtin ser kirê u mesrefên germayê (heke li ber dest be)

Heke we **25 salîya xo tijî nekiribin**, u hîn di navmalîya dêubavê xwe de dijîn, zanyarîyên din li ser xanîyê ta nuha pêwist in:

- mezinahîya xanî,
- jimara jureyan / odeyan
- jimara kesên malbatê,
- para mesrefan

Her wiha xanîguherrandin bes pêwiste, heke

- jî ber sebebên giran yê civakî hun (êdî) nikanibin di nav xanîyê malbatî ya dêubav xo de bimînin,
- xanîguherrandin jî bo pêgirêdana bi bazara kar pêwist be (di vê rewşêde dawaznameyek
- bi vê mebestê bo fermangeha kar bi pişandan peymanîya kar were pêşkêşkirin)
- mebestek din, wekî mebestek giran / îcbarî hebe

Hebuna sebebêk wisa divêt jî bal we **bi durudirêjî were danasîn.**

Bi kerema xo bal bidin van bingehên yasayî / qanunî yê jêr:

- Bo wergirtina mesrefên xanîpêdekirin u malbarkirin pêwistîya îcbarî bi rizamendî yê pêşin heye. Ev dikane qa`îden were cêbicêkirin, heke xanîguherrandin bi fermana qeymeqamîyê birêve diçe yan jî jî ber sebebêk din ya îcbarî pêwist be u bêyî rizamendî xanîyek di demek maqul nehatibe dîtin ( benda 22 feqere 6 ya Pertuka Yasaya Komelgehî II - SGB II).
- Dayina temînata kirê wek deyn / qerz jî bal fermangeha deverî ya berpîrs bi heman şêwe pewistî bi rizamendî heye ( benda 22 feqere 6 ya Pertuka Yasaya Komelgehî II - SGB II).
- Heke mesrefên xanî u germayê piştî xanîguherrandinê nepewist zêde bibin, bes pêdivîyên ta nuha dihêtin qebulkirin (benda 22 feqere I ya Pertuka Yasaya Komelgehî II - SGB II).
- Bo kesên 25 salîya xo neqedandibin mercên taybet hene (benda 22 feqere 5 ya Pertuka Yasaya Komelgehî II - SGB II).

**Xanîguherrîn pêkwere (bi rizamendî an bê rizamendî) divêt qeymeqamî bêyî demborandin li ser dem u ciyawazîya mesrefan were agahdarkirin. Serekî divêt hemu guhertin were pêgîhandin.**

**Pirsên we yê din hene?**

**Bi kerema xo serî li karmendên jobcentera xo bidin.**